

# Sunetkirina keç û jinan – dikarî alîkariyê wergirî

## Herdem behsa sunetkirin yan tehdîda wê bike

- Eger tirs sunetkirinê li ser te hebe, behsa wê bo nimûne li ba karmendên Daîreya Koçberan, navenda pêşwazîkirinê, xwandingehê yan bingehê tendurستیê bike. Ew dikarin alîkariya te bikin eger tu berê hatibû sunetkirin jî. bike.
- Sunetkirin yan tirs wê dikare bibe sebebê wergirtina îqameyê ji Fînlândayê.



## Dikarî alîkariyê bo ziyânên sunetkirinê wergirî

- Sunetkirin dikare bibe sebebê pirsgirêkên dijwar. Doktor dikare alîkariya te bike.
- Dikarî herwiha alîkariyê wergirî eger ew mijar serê te biêşîne.

## Li Fînlândayê mirov ji sunetkirinê tîn parastin

- Li Fînlândayê nabe ku ji jin û keç bêyî sebebên tibî werin sunetkirin. Herwiha nabe li derveyî Fînlândayê jî tu werî sunetkirin.
- Te maf heye biryarê li ser leşê xwe bidî. Nabe bêyî ruxseta te kesekî din dest bike leşê te. Eger bêyî îradeya te kesekî tiştêkî li te bike, hukimdarên Fînlândayê dê te biparêzin û alîkariyê bidin te.

## Eger tu bizanî ku kesek din hewceyî alîkariyê ye

- Eger tirs li ser kesekî din heye ku were sunetkirin, tu dikarî behsa wê bo nimûne li ba karmendên Daîreya Koçberan, navenda pêşwazîkirinê, xwandingehê yan bingehê tendurستیê bike.
- Ku tu behs bikî, dikare alîkariya wê kesê bike.

## Manaya sunetkirinê çi ye?

- Sunetkirina keç û jinan birrîna parçeleşê wan yê cinsî ye. Manaya birrînê ziyantêkirina yan jêvekirina parçeyên derveyî yê cinsî ne bêyî sebebêkî tibî.